

Ji Penûsê Jinê Rastiya Jiyanê

# RAPERÎN

Dîrok: Tebax 2023

Hejmar: 09

Biha: 1000

## EM Ê BI CIVAKÎKIRINA KEDA MALÊ AZADIYA XWE MISOGER BIKIN



NÊRÎN

2

Bijî Şoreşa Me Ya Jin:  
Jin Jiyan Azadî

ROJEV

3

Keda Hundirê Malê Çi Ye  
û Divê Çi Bê Kirin?

JIYANNAME

7

Li Dijî Mêtîngeryê  
Sembola Vîna Jina Azad;  
Leyla Qasim



# Bijî Şoreşa Me Ya Jin: Jin Jiyan Azadî

Şoreşa me ya ku me bi hişmendî û vîna xwe ava kir û di oxira wê de bedêlên mezin dan 11 salên xwe li paş xwe hişt. Ligel rêbazên şerê taybet û psîkolojîk êrîşên polîtîk û aborî yên pergala kapîtalîst a serdestiya mêr û êrîşên dagirkeriyê li ser piyan e. Şoreş ligel hebûna dewleta Tirk a mêtînger û dagirker ket sala xwe ya 12an.

Berî 11 salan çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê hat pêxistin. Agirê şoreşê berê li axên Rojava piştê jî gav bi gav belavî axên Bakur û Rojhilatê Sûrî bû. Ligel tevahî bêderfetiye xwe şoreşa me ji tevahî Kurdistanê re dibe hêvî û li dijî tarîtiya Rojhilata Navîn dibe ronahî. Şoreşa me di heman demê de ji tevahî gelên bindest ên ku di nav xizaniyê de dijîn jî dibe hêvî. Ev hêvî ne vala ye: gelê Rojava û gelê me yên çar parçeyê Kurdistanê ku berî 100 sal bi hevpeymanê Lozanê hat parçekirin û mêtîngehkirin ziman, çand û hebûna xwe ya netewî nîşanî cîhanê da. Di nav siyaseta ku li Rojhilata Navîn gel bi hev re tê dijinkirin li Rojava gelan bi hev re jiyana wekhevîxwaz û azadîxwaz avakirin. Wayê ev hêvî hêviya şoreşa Rojava ye.

Şefê faşîst Erdoganê ku bi piştgirî dayina DAÎŞê nikarîbû armanca xwe bibe serî bi artêş û çeteyên xwe yên berhevkirî, tanq, top û tevahî sîlehên xwe êrîş kir, dagir kir û hîna jî êrîşkariya xwe berdewam dike. Bi deh hezaran lêhengên me ji bo parastina ev axên ku lê azadî û wekheviya jin hatiye avakirin bi awayekî fîdayî şerkirin û şehîd ketin.

Li axên şoreşê yên Rojava ku her roj di bin êrîşan de ye gelên me û pêşengên şoreşa me yên jin bi şiyara "destpêkê li jinan bidin" a SÎHAyên artêşa şefê faşîst Erdogan tîndarî hêdîgirtin. Hedefa herî dawî ya dewleta dagirker a Tirk nûnerên Rêveberiya Xweser ên Qamişlo bûn. Bi hewldana afirandina îqlîma tirsê dixwazin axên me vala bikin. Tê xwestin ku şoreşa me ya ku tê de hêvî û pêşeroj tê avakirin bê xenikandin û rihê berxwêdêr ê şoreşê bê belawelakirin. Gelên me bersiva herî xurt a vê êrîşê bi awayekî girseyî ya tevlibûna merasîma Yûsra Derwîş, Lîman Şiwêş û Firat Tûma dan.

## Bazariyên Emperyalîst û Planên Tesfîyêkirinê

Li ser şoreşa me teva planên dagirkeriyê lîstokên qirêj û bazarî berdewam dikin. Di mehên derbasbûyî de li Astana civîna 20emîn û di demeke nêzik de di civînên NATOyê de li dijî şoreşa me bazarî û planên qirêj hatin kirin. Yek ji aliyê ev bazariyên qirêj teva hêzên emperyalîst dewleta Tirk a ku yek ji sedema 4 parçebûn û mêtîngehbûna Kurdistanê

dagirker û mêtînger de ne, di aliyekî de jî di bin dorpêç û êrîşa awahiya pergala serdestiya mêr a paşverû de ne. Em weke Jinên Komûnîst ên Şoreşger bawer dikin ku em ev êrîşên dagirker û dorpêça paşverû bi mezinkirina xweparastin û rêxistinbûna xwe dikarin belav bikin. Ji ber vê yekê divê em di aliyekî de li dijî serdestiya mêr a civakî têkoşîna xwe ya parastina destkeftinên xwe yên azadîxwaziya jin mezin

bi hilweşandina çar dîwarên malê yên ku zayenda jinê dike kole azadî tê bi dest xistin. Divê em hêza guherîner a vîna jinê di nav tîkîliyên civakî û di nav tîkîliyên malbatî de hîna xurtir nîşan bidin. Ên ku di cepheyan de li dijî hovitiya DAÎŞê û artêşa dewleta faşîst a Tirk şer dikin em in, ên ku bingeha siyaseta şoreşê ava dikin û bi rê ve dibin em in, ên ku li zevîyan, li malan kedê diafirînin em in. Di tevahî qadên jiyane de bi



bû. Şoreşa me ya Rojava îro li hember Lozanê berbesteke. Şoreşa Rojava îro li Kurdistan û dewletên mêtînger fişenga nîşanê ya şoreşên nû ye û planên mêtîngeran xirap dike. Ji ber vê yekê ji bo tunekirina şoreşa me plan û tifaqên emperyalîst tîndarî kirin. Lê careke din dixelitin. Ji ber ku ne Kurd, ne jin ne jî gelên herêmê êdî ne wekî duh in. Gelê Rojhilat li ser piyan e û weke jin, karker û kedkar li dijî faşîzma Melelî li ber xwe didin. Li Bakurê Kurdistanê gelên me û jin li dijî şerê faşîzma AKP û MHP li ber xwe didin. Gerîlayên me li dijî êrîşên bi sîlehên kîmyevî mewziyên xwe diparêzin û rê nadin artêşa faşîst a Tirk. Em li dijî feraseta Lozanê ya ku qebûlkirina bûyîna netewa mêtîngeh, ji bo mafên xwe yên kolektîf, ji bo ziman, azadî û çanda xwe li ber xwe didin. Em ê weke jinên welatparêz ên sosyalîst û komûnîst teva gelê xwe heta dawî şoreşa xwe biparêzin.

Em weke jin li Rojava di aliyekî de di bin dorpêça

bikin û bi vê rêyê hêz û vîna jinê ya guhertinê bixin hundirê malan. Divê îro em hîna zêdetir giraniya xwe bidin ser van erkên xwe.

Şoreşa Rojava nîşanî tevahî jinên bindest ên cîhanê da ku pergala kapîtalîst a serdestiya mêr ne çarenûsa me ye û dîsa gengaziya jiyana azadîxwaz a zayendî nîşan da. Lê şoreşa me hîna jî tevahî newekheviyên dîrokî ku zayenda jin dijîn ji holê ranekiriye. Em weke jinên ji tevahî gelên Kurd, Suryan, Êzîdî, Ereb, Misilman, Xiristiyan, ol û baweriyên din hîna bi zexta serdestiya mêr ve rû bi rû ne. Keda me ya hundirê malê hîna bînirx tê dîtîn û ji ber vê sedemê tevahî barê malê li ser milên me ye. Ji me beşeke mezin hîna nikare biryarên li ser jiyana xwe bide. Hîna tîkîliyên eşîrtî û malbatî, edet û teqelîd jiyana jinan diyar dike û wan dorpêç dike.

11 sal e di nav şoreşê de bi cihgirtina di cepheyan şer û tevahî sazîyên şoreşê de ên ku mafa xwe ya hebûnê bi dest xistin. Şoreşa me nîşan da ku tenê

xwedî derketina li keda xwe û meşandina têkoşîneke ji bo jiyaneke hevbeş wê pergala serdestiya mêr ji kok ve hilweşe.

Cihê me tena ne mutbex e, cihê me tevahî navenda siyaseta ye. Ji ber vê yekê divê em bi civakîkirina keda malê tevlibûna xwe ya jiyana civakî hîna mezintir bikin. Qasî ku em bi hêzên xwe yên leşgerî axên xwe diparêzin, divê em di her qadê de bi mezinkirina rêxistinbûna xwe têkoşîna xwe ya azadî û wekheviya zayendî mezin bikin. Wekî ku li tevahî welatên Rojhilata Navîn, divê em li Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî jî li dijî tundiya mêr a ku mezin dibe destkeftin û mafên xwe xurt bikin. Ev têkoşîn qasî şerê li dijî DAÎŞê û dewleta Tirk girîng e. Di vê bingehe de erkên me yên şoreşger berdewam dikin. Em ê weke jinên Suryan, Kurd, Ereb, Ermen û tevahî pêkateyên şoreşa jinê bi hev re mil bi mil piştgiriya xwe mezin bikin û bi tecrûbeyên xwe yên hevbeş vîna jinê xurt bikin.



# Keda Hundirê Malê Çi Ye û Divê Çi Bê Kirin?

Em bi pîrsekê destpê bikin: Ji karên hundirê malê çima em weke berpîrsiyarên di pileya yekemîn de tên dîtin?

Hinek kar weke karên jinê, hinek kar jî weke karên mêr tên dîtin. Karên malê, xwedîkirina kesên hundirê malê weke karên jinê tên binavkirin. Qezençkirina pere, pêşwazîkirina pêdîwiyên madî yên malê di esasê de karên mêr tên binavkirin.

Keda hundirê malê çi werdigire hundirê xwe? Ligel Paqijî, kewî, çêkirina xwarin, şuştina firaxan, lênihêrîna kal û pîr, zarok, astengdar, nexweş an û hwd.

Derveyî ev karên ku me hejmartin, bi ser de berpîrsiyartiyên zîhnî tê barkirin ser milên jinê. Li gorî vê divê jin bibe kesê ku aramî, hezkirin, rêzdarî û bibe kesê ku dorhêla nava malbatê dabîn dike. Ligel ku tevahî karên fizîkî yên westîner dike divê ew her tim bi hezkirin dagirtî be û kêfxweş bibe, divê di nav malbatê de ne ji mêr, ne jî ji kesên din beramberiya keda xwe naxwaze. Weke pêwîstiya dayikî û rola hevjiñbûnê divê her tim fidakar, dayende bibe û tu carî zû aciz nebe, divê her tim vepesrîner bibe û her tim karibe hestên xwe kontrol bike. Tevahiya van hîna ji zarokî de tê fêrî jinan kirin.

Gotineke gel heye: "Hêlînê çivîka mê çêdike." Ji me jinan tê xwestin ku em vê qebûl bikin. Gerek di alî fizîkî de, gerek jî di milê manewî de ev erkên zehmet, westîner kê da me?

## Keda ku Nayê Dîtin

Keda hundirê malê mijareke civakî û pergaliye. Hîna di kêliya ku em weke zarokên keçik tên dinê de ev rol tên fêrî me kirin. Avahiya malbatî ya baviksalar jî vê rewşê rasterast berpîrsiyar

e. Jin derve bixebitin an jî nexebitin di her rewşê de weke berpîrsiyarê karên hundirê malê jin tên dîtin. Keda hundirê malê hem li gorî karbeşiya zayendê tê xwezayîkirin, hem jî weke karekî weke profosyonel nayê dîtin. Ev tevahî keda hundirê malê ji bo ku mafa fon, sîgorta û mafa sendîkayê tune ye weke pîşeyekê nayê dîtin. Ji ber vê yekê em keda hundirê malê ya jinê weke "keda ku nayê dîtin" bi nav dikin.

Avahiya malbatî ya baviksalar berî 7 hezar salan bi derbasbûna mirovahiyê ya civaka koledar re destpê kir. Bi destpêkirina civaka koledar ve jin hepsî malê hatin kirin. Weke tiştêkî eydî mêr dest hat danîn ser beden, mêtî û hestên jinê. Bi vî awayî jin hat kirin milkê mêr. Jin ji bo ji silaleyê mêr welidandina zarokan, ji bo berdewamkirin û parastina mîrasê mêr û xwedîkirina zarok, malbat û malê hat kolekirin. Berî civaka koledar di civaka komûnal a yekemîn de jin û mêr du zayendên wekhev bûn. Jin azad bû. Keda hundirê malê an jî erkên jinê yên weke karên malê tunebûn. Tenê erkên hevbeş ên mirovên ku bi hev re dijiyan hebûn. Ji karên hundirê malê heta xwedîkirina zarokan tevahî ev ked civakî bû. Lê bi derketina milkê xas derbasî civaka koledar hat bûyîn. Di pergala feodal a ku piştî wê hat de, di pergala kapîtalîst û serdema emperyalîzmê de jî koletiya jinê ya hundirê malê berdewam kir. Ev pîrsgêrêka kokdar ku heta îro berdewam kir encax bi derbasbûna sosyalîzm û komûnîzmê dikare ji holê rabe.

Keda hundirê malê çima heta mirinê weke "deynê stûyê jinan" tê dîtin? Bêgerew mayina keda hundirê malê nifş bi nifş

berdewamkirina vê, her tim ji nû ve afirandina vê ya pergale rê li ber "fetla keda hundirê malê" vedike. Ev fetla bêşûd dihêle ku barê li ser milên jinê hîna zêdetir bibe û jin derveyî jiyana civakî bimîne. Jin êdî hîn dibin ku vê şaştiyê weke rastiyeke bibînin. Mixabin jin jî bawer dike ku ev kar karên wê yên xwezayî ne! Baş jî ev karên ku em karên xwe yên xwezayî dibînin em weke fizîkî û zîhnî çiqasî bi bandor dibin.

## Encamên Neyînî Yên Fizîkî û Psîkolojîk

Di destpêka pêkerên fizîkî de: westana domdar, êşa serî û mayde, şeqîqe, êşên domdar ên kawik, pişt û hestî, di encama kar de birîndarbûn, asta bilind a bêhtengî û fikar, zû acizbûn û girî, tengijîn, zêdebûna fikrên bixiş, nexweşiyên weke seletan û HWD. tên.

Di destpêka pêkerên zîhnî de jî ev tên: Jin nikarin tena bi serê xwe biryarekê bigirin û ger tim girêdayî şexsekî din dijîn, jin her tim xwe kêmbîne û keda xwe bêniyx dibîne, nikare xwe îfade bike, nikare hest û fikrên xwe bîne ser ziman, xwe bawerî û îzetînefsa wê xirap dibe, rewşa jihalketin dijî, nikare derd û xemên xwe parve bike. Civakîbûna wê ji holê radibe. Ev tiştên ku me li jor jimartin dibe ku her tim di heman astê de nayên jiyîn.

Ne pêwîst e ku em mijarê hîna kûrtir bikin. Ji ber ku jixwe van rastiyan hûn weke jin di jiyana xwe de dibînin. Lê divê em ji bo çaresariyê çi bikin? Keda hundirê malê hêja ye. Lê ev tenê ne karê jinê ye. Ev karê tevahî şexs û pergala civakî ye.

Berî sed salan li Rûsyayê di komara rêveberiya sosyalîst a karker û kedkaran de ji bo van pîrsgêrêkan çaresariyên wiha hatin dabînkirin: cilşoxaneyên

tomêrî, xwaringehên civakî, li her derê rawdayên bêpere yên zarokan û warên bêpere yên lênihêrîna nexweş, kal û pîran hatin vekirin, ji bo jinan qadên gelekî berfireh yên xebata civakî û aborî hatin vekirin. Yanê tevahî karên hundirê malê hatin civakîkirin û bi vî awayî jin ji %80 û 90 tevî jiyana civakî bûn. Jinan jî wekî mêran derfeta derketina derve û xebatê bi dest xist. Tevahî jinan di komara sosyalîst de erk girtin ser milên xwe, şaxên pîşeyî yên cur be cur de perwerde dîtin û xebitîn. Bi vî awayî jin tevî jiyana civakî û çandî bûn. Îro jî di gelek welatên cîhanê de rojev û daxwazên wekî bi fonkirina keda hundirê malê ya ji aliyê dewletan ve, mafa sîgorta û teqawîdî, avakirina sendîkayên ku van mafan misoger bikin û di van sendîkayan de rêxistinbûna jinên kedkar ên hundirê malê hene.

## Jinên hêja!

Di welatê me yê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî de avakerên şoreşa Rojava di heman demê de jin in. Me di cepheyan de teva şervanên mêr şer kir. Me di bajar, bajarok û gundên xwe de di alî avakirina qada siyasî û civakî de erkên pêşeng girt ser milên xwe. Bi bendên zagonên jin ên hevpeymanî Rêveberiya Xweser hinek mafên me hatin misogerkirin.

Em îro çawa dikarin asta îro derbas bikin û hîna zêdetir pêş ve biçin? Pîrsgêrêkan ku berdewam dikin çi ne? me çi bi dest xist û çi bi dest nexist? Dema ku em li bersivên van pirsan digeriyan me biryara kişandina pêşiya xwe ya ev mijara herî girîng da. Ev mijara herî girîng çi ye? Bêguman pîrsgêrêka keda hundirê malê ye. Em jinên ku wek azadî û wekhevî dixwazin Kedkariya malê ya ku di jiyana me de dibin zincîrên koletiya me lêpîrsîn dikin. Guherîn gengaz e. Ger em bixwazin û têbikoşin tiştêkî ku em nikarin biguherîn in tune ye!

Divê em li dijî îstîsmariya keda jinê ya hundirê malê û koletiya jinê ya malê çi bikin? Hûn jî dikarin bi nêrîn û keda xwe tevî hemleya me ya nû ya siyasî ku me weke JKŞ destpêkiriye bibin? werin em zincîrên koletiyê bi hev re bişkinin.



# Şoreşa Jinê ya Rojava Vîna Hemû Jinan e

Şoreşa 19ê Tîrmehê ji bo ku jin xwe hîna zêdetir ji civaka baviksalarî û pergala dewletparêz a ku ew bi rê ve dibir rizgar bikin şanseke bingehîn ava kir û derfet da ku rola xwe ya pêşeng di avakirina pergaleke nû ya civakê de bilîze.

Jinan weke nûnerên şoreşa 19ê Tîrmehê hem di qada leşgerî de, hem jî di qada civakî û siyasî de ji bo çaresariya demokratîk a Sûrî di refên herî pêş de cih girtin. Bi taybetî jinên Kurd di destpêka şoreşê de bi saya rêxistinbûna xwe li tevahî herêma Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî roleke pêşeng lîstin û şoreşa 19ê Tîrmehê li ser vê esas û bingehê di tevahiya cîhanê de weke şoreşa jin hat naskirin.

Jinan di qadê de bingeha azadîxweziya jin ava kir û bi vê rêyê derbeke mezin li feraseta baviksalarî û serdestiya mêr a hezar salan xist. Girîngiya rêxistinbûyîna xweser di vê mînakê de careke din derket holê. Rêxistin û meclîsên jin ên ku hîna beriya şoreşê hatibûn

civakê de pergala hevserokatîyê tecrûbeyeke girîng derxist holê. Bi vê sayê feraseta ku civakê, siyasetê, leşgeriyê her tim mêr bi rê ve dibe hat serûbinkirin. Ji xwe wateya şoreşa jin ku “Şoreşa jin serûbinbûyîna civakê ye” di Rojava de bi awayekî eşkere şênber bû. Beşdarbûna jinan di rêvebirina civaka xwe de bêdaraz û jinan rengekî taybet da şoreşê ku wê ji hemû şoreşên cîhanê cuda bike. Herêmen Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku meclîs, sazî û dezgehên sîvîl, siyasî û leşkerî bi rê ve dibin îro li ser vîn û mêjiya jinê pêş dikevin.

Heta di dîroka gelên bindest de gelekî şoreş çêbûne. Di van şoreşan de destkeftinên jinan ên gelekî mezin hatine bi dest xistin. Heta em dikarin bêjin ku şoreşa Rojava ya jin jî bingeha xwe ji van şoreş û destkeftinên jinan digire. Lê dîsa em dikarin bêjin ku tecrûbeya şoreşa Rojava ya jinê bi sazî û dezgehên xwe û bi misogeriya mafa jinan û rêxistinbûyîna xweser a jinan tecrûbeyên wan şoreşan derbas kiriye.

tevahî jinên bindest ên cîhanê.

Di şerê Kobanê, Reqa, Girê Spî, Minbic, Hol, Şedadê û hwd. de YPJ bi pêşengî û berxwedaneke fidayî dawî li pergala zilma DAIŞê anî û careke din vîn û nasnameya jinê îspat kir.

## Şoreşa jinê hêviya azadiya hemû jinên cîhanê ye

Jinên karker û kedkar li dijî kapitalîzmê û her cûre tundiya li ser wan tê meşandin têdikoşin û ji ber vê yekê divê em baş bizanibin ku şoreşa Rojava şoreşa azadiya hemû jinên cîhanê ye.

Rola jinên komûnîst ji destpêka şoreşê de heta niha di tevahî qadên civakî, siyasî û leşkerî de bi awayekî çalak bû. Jinên komûnîst hîna di destpêka şoreşê de di nav grûpên yekemîn ên gerîlayên ku berê xwe dan Rojava de cihê xwe girtin û di asta hem fermanarî, hem şervantî û rêxistinîkirin û tevîkirinê jinan ya nav tevî refên YPJê de cihê xwe girtin. Jinên komûnîst di aliyekî de di tevahî rizgarkirina

Dîsa jinên komûnîst di destpêka şoreşê de heta niha di xebata avakirina şoreşê de jî cihê xwe girtin û bûn xwedî kedeke mezin. Jinên komûnîst ji avakirina komîn û meclîsan heta qada tendurîstî, şaredarî, asayîş, ragihandin, avakirina bingeha ciwanên şoreşger û xweparastinê de roleke girîng lîstin.

Di sala 2015an de bi avabûna Saziya Yekîti û Piştgiyaya Gelan (SYPG) jinên komûnîst di qada navneteweyî de ji bo gîhandina dengê şoreşê ya tevahî jinên cîhanê xebateke taybet dan meşandin. Di aliyekî de di bin rêxistina SYPGde li qadên ku tê de navendên xwe avakirin di bin siwana TEV-DEMê de bûn xwedî roleke girîng. Jinên komûnîst di bin siwana SYPGê de destpêkê de xwe bi navê SYPG Jin rêxistinîkirin, piştî wê bi avakirina Jinên Azad ên Sosyalîst (JAS) gava xwe ya yekem ber bi rêxistinbûna xwe ya serbixwe ve avêt. JAS di heman demê de bû bingeha rêxistina Jinên Komûnîst ên Şoreşger a îroyîn. Jinên Komûnîst ên Şoreşger îro ji Kobanê heta Dirbêsiyê, ji Heskê heta Til Temir, Qamişlo û hemû qadên din de li ser asta parastin, avakirina şoreşê û avakirina fikir û felsefeya komûnîzmê xebatên xwe dide meşandin. Em dikarin bêjin ku JKŞê destpêkê de berhema têkoşîna jinên komûnîst a sîh salan e. Lê di aliyekî de bi asta rêxistinbûna xwe berhema şoreşa 19ê Tîrmehê ye jî.

Di nava jinên kedkar de xebatên birêxistinîkirinê meşandin û ji bo ku jin di nava refên şoreşê de cih bigirin hîna jî kedeke mezin didin û bi coş, cesaret û keda xwe xebatên xwe didomînin

## Divê Em Destkeftinên Xwe Biparêzin

Bi saya destkeftinên jinan e ku em bi saya van destkeftinan dikarin şoreşa Rojava vebêjin. Şoreşa me îro 11 salên xwe li paş xwe dihêle û dikeve sala xwe ya 12emîn. Îro bêguman vê şoreşê ji qada civakî heta siyasî û dîrokî hişt ku gelek guhertin çêbibin. Îro qasî destkeftinên me kêmasiyên me jî hene, lê tu tişt qasî azadiya jinê ya civakî ne hêjatir e. Çawa ku em jin bi kirdebûna vê şoreşê bûn pêşengên azadiyê îro pêwîst e ku em xwedî li keda xwe û bi hezaran şehîdên jin ên lêheng derkevin.



avakirin piştî destpêkirina şoreşê bû derfet û bingeha girîng. Piştî şoreşê di her qadê de de avakirina rêxistin û saziyên jinê bû misogeriya parastina maf û destkeftinên şoreşê.

Di serî de bi avakirina Kongra Star, Mala Jin, Rêxistina Sara ya Komeleya têkoşîna li dijî tundiya jinê, Meclîsa jinên Bakur û Rojhilatê Sûrî, Meclîsa Jinên Sûrî, Koma Zenûbya, rêxistinên jin ên çanda hûner, rêxistinên jinên rewşenbîr, asayîşa jin, HPC Jin û hwd. li dijî feraseta baviksalarîhişmendiyê azadiya jin û wekhevîyê ava kir.

Bi taybetî di aliyê rêvebirina

## Misogeriya Tevahî Destkeftinan; Artêşbûna Jinê

Jinên ku di tevahî qadên şer û qad û saziyên civakî de cihê xwe girtin di milê leşgerî de jî pêşengtiya raman û felsefeyeke nû kirin. Bi tevîbûna hezaran jinan a nava refên YPGê rê li ber artêşbûna jinê vekir û bizirên artêşa jinê hîna di sala 2013an de bi avakirina tabûrên jinê hate avêtin û ev bizir bûn bingeha artêşa jin a YPJê. Bêguman sembola berxwedana jinan a herî berbiçav berxwedana Kobanê bû ku YPJê bi berxwedaneke nav û deng hevî û îlham da

hamleyên Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrî de cihê xwe girtin, xwe di nav refên YPJ, Tabûra MLKP a Şehîd Serkan de, tabûra tabûra azadî ya enternasyonal de rêxistin kirin. Ji şerê Serê Kaniyê yê yekemîn heta hemleya mezin a Rûbar Qamişlo, ji şerê Til Temirê heta Kobanê ji Girê Spî, Hol, Tişrîn, Şedadê, Minbic, Reqa, Efrîn, Şengalê û heta şerê dawî yê Serê Kaniyê cihê xwe girtin. Di vê oxirê de şehîd û birîndar dan. Şehîd Sarya Ozgur, Îvana Hoffmann, Raperîn Dicle, Destan Temûz û Zilan Destan bi şehadeta xwe bûn sembola berxwedana jinên komûnîst.



# Li Dijî Mêtîngeriye Sembola Vîna Jina Azad; Leyla Qasim



Leyla Qasim 1952an de li Kerkukê di malbateke feqîr û bindest de ji dayik bû. Li herêma Xaneqîn mezin bû. Pênç xwişk û bira bûn. Malbata wê malbateke feqîr û welatparêz bû. Di malbat û derdoreke welatparêz de mezin bû. Herêma ku ew lê mezin bû di heman demê de cihê petrolê bû. Ji ber vê siyaseta BAAS di vê herêmê de pir xurt hat meşandin. Leyla Qasim rastiya burjuvaziya mêtînger û lîstokên wê ku li ser axên Kurdistanê dihat meşandin hîna di zaroktiya xwe de nas kir.

Leyla Qasim dibistana seretayî û amedayî li Xaneqînê xwend. Malbata wê piştî demekê ji ber zilm û zordestiya Saddam a Erebkirina herêmê neçar ma û koçî Bexdayê kir. Leyla Qasim li vê derê beşa civaknasî xwend. Dema ku zanîngeh dixwend di aliyekî de ket nav lêgerîna azadiyê. Di sala 1970an de hîna di temenê xwe yê 18 salî de tevî nav refên Partiya Demokrat a Kurdistanê bû. Di van salan de bû yek ji damêzrênera Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê û di vir de bi awayekî çalak xebitî. Di nav ciwanên xwendekar de bi taybetmendiyên xwe yê wêkî xwebawerî, hêza xwe ya bandorker, jîr û jêhatî derket pêş.

Di sala 1970an de di navbera dîkdatorê faşîst ê Iraqê Saddam û rêberê gelê Kurd ê Başûrê Kurdistanê Mele Mistefa Berzanî de hevpeymanek hat çêkirin. Li gorî vê hevpeymanê gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê pergala xweserbûyînê bi dest xist. Lê dîkdatorê faşîst Saddam li gorî hevpeymanê tevnegeriya û li dijî Kurdan dest bi zilm zordestiyê mezin kir. Her roj bi dehan ciwanên Kurd dihatin qetilkirin. Leyla Qasim û hevalên wê ji bo ku vê zilm û zordariyên bişkênin û hawara Kurdan bigihînin cîhanê xwe ji bo çalakiyê amade dikirin. Weke jina pêşeng a Filistîne Leyla Xalid wan jî biryar dabûn ku balafirekê birevînin. Lê hîna di destpêka vê çalakiyê de bi hevalên xwe re hate girtin. Di sala 1974an de îşkenceyê mezin dît. Di encama dadgehkirineke simbolîk de di 13ê Gulana 1974an de hate darvekirin

Leyla Qasim û çend hevalên xwe dixwastin bi çalakiyê mezin bersiva zilma rejîma Saddam bidin. Tam di vê heyamê de jina şoreşger Leyla Xalid a Filistînî li dijî

siyonîzma Îsrailê balafirek revand û vê çalakiyê bandor li tevahî gelên cîhanê yê bindest kir. Leyla Qasim û rêhevalên xwe jî ev çalakî ji xwe re weke mînak girtin. Wan jî dixwast çalakiyê revandina balafirekê bikin û zilm û zordestiya Saddam bi tevahî gelên cîhanê bidin bîhistin. Hîna dema ku amadekariya çalakiyê dikirin yek ji hevalên wan ji aliyê rejîma BAAS a Saddam ve hat girtin û plansaziya wan xirap bû. Rejîma BAAS bi hovitiyê mezin bi ser xwendekaran ve çû piştî demekê Leyla Qasim û hevalên wê hatin girtin.

Leyla Qasim û rêhevalên xwe di şkencexaneyên rejîma faşîst a Saddam de rastî şkenceyên gelekî giran hatin. Lê di tu kêliyan de li dijî dijmin serê xwe netewandin û dev ji doza xwe bernedan. Îstixbarata rejîma Saddam bi taybet dixwast ku Leyla Qasim bikişînin nava xiyaretê û ji serokomarê Iraqê lêborîna xwe bixwaze. Lê bersiva Leyla Qasim ji rejîma faşîst re wiha bû "Ger ku ez ji karekî vê cîhanê poşman bibim ew e ku ez zû dimirim. Ez bikaribim demeke dirêj ji bo gelê xwe xebat bikim ez ê hîna bikim, ger ku ez daxwaza lêborînê ji kesekî bikim wê demê ez daxwaza lêborînê ji gelê Kurd dikim, ji ber ku di rastiyê de ji bo doz û pirsgerêka netewa Kurd kêma xebat kiriye."

Dijmin li dijî vê bersivê hîna zêdetir aciz bû û xwest ku agirê vê berxwedanê vemirîne. Sekna Leyla Qasim dikaribû qasî gelê Kurd bandor li gelên Ereba jî bike. Ji ber vê yekê bi lez û bez hat dadgehkirin. Di dadgehê de Leyla Qasim li ber dadgerê mahkeme bi dengeke bilind bersiveke wiha da "Min bikujin, lê vê rastiyê bizanibin ku bi kuştina min wê bi hezaran Kurd ji xewa giran şiyar bibin, ez gelekî kêfxweş im ku ez bi serfirazî di rêya azadiya Kurdistanê de canê xwe fida dikim."

Leyla Qasim bi vê sekna xwe hêza jina Kurd weke femandereke mezin ku li dijî mêtîngeriye şer dike îspat kir. Rejîma faşîst a Saddam ji vê hêzê tirsîya xwestin ku di şexsê Leyla Qasim û rêhevalên wê de hêz û vîna gelê Kurd bişkênin. Ji ber vê yekê di 13ê Gulana 1974an ber bi sibehê ve di saet 7ê berê sibê de Leyla Qasim û rêhevalên wê hatin darvekirin.

Leyla Qasim di bin şkenceyên giran

de her çiqasî ku êşên gelekî giran jiya jî li ber rêhevalên xwe bi rûyekî kêfxweş serê xwe bilind kir. Ji dayîka xwe re digot "Negrî ku dijmin kêfxweş nebe." Berî ku biçe ber kursiyê darvekirinê cilên xwe yê neteweyî li xwe kir. Ev li dijî pergala BAAS a faşîst bersiveke polîtîk bû. Li dijî siyaseta mêtîngeriye ya înkarkirin û hewldana tunekirina Kurdan dixwast bi çanda Kurdî bersiv bide. Leyla Qasim bi vê sekna xwe di heman demê de nîşan da ku ji bo welat fidakirina canê xwe kêfxweş û rûmeteke. Dema ku gîhaşt kursiyê darvekirinê nehîşt ku dijmin çavên wê girê bide. Di deqeya dawî ya jiyana xwe de li ser kursiyê darvekirinê li rûyê dijmin nêrî û sirûda neteweyî ya "Ey Raqîb" qîr kir û di hilma xwe ya dawî de jî ji bo Kurdistanê azad bang kir. Leyla Qasim, Cevad Hemevendî, Nerîman Fuat, Mestî, Hesên Heme Reşat, Azad Sileyman Mîran di vê rojê de bûn sterkên Kurdistanê û azadiya gelan. Wan ji bo azadiya Kurdistanê heta dawiya jiyana xwe li ber xwe dan û li dijî mêtîngeriye seriyê xwe netewandin. Berxwedan û darvekirina Leyla Qasim û rêhevalên wê di nav gelê Kurd de, bi taybetî jî di nav jin û ciwanên Kurd de bû çirûska têkoşînê û wêkî ku wê di dadgehê de gotibû piştî darvekirina wan bi hezaran jin û ciwanên Kurd ji xewa giran şiyar bûn û li dijî mêtîngeriye tevî nav refên têkoşînê bûn.

Leyla Qasim yek ji jineke Kurd a ciwan li dijî mêtîngeriye bi sekna xwe ya berxwedêr û vîna xwe bû pêşenga jin û ciwanên Kurd. Di dîroka Kurdistanê de yekem jina ku teva rêhevala xwe ya Nerîman Fuat hatiye darvekirin e. Wê tevîbûna xwe ya nav refên têkoşînê wiha şirove dikir "Min xwest ez nîşan bidim ku jin jî ji bo welat dikarin tevî têkoşînê bibin û canê xwe fida bikin." Leyla Qasim bi pratîka xwe hêz û girîngiya rola jinan ji bo têkoşîna gelên bindest careke din pêşkeşî herkesî kir. Wê li ber dadgehên faşîst ên mêtînger de careke din nîşan da ku mirineke bi rûmet ji jiyaneke koletî hêjatir e. Leyla Qasim jî weke jineke Kurd çawa ku di dîroka gelê Kurd de bû şopdara Zerîfe û Besêyan îro di çar parçeyê Kurdistanê de bi hezaran Leyla, Bêrîtan, Zîlan, Berçem, Sarya jî şopdarên wê ne.

## Bangewaziya Heyamê: Dem Dema Zîlanan e

Em weke Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger şopdarên rêheval Zîlan Destan û şopdarên bi hezaran jinên têkoşer in.

Me beriya demekê ji bo bîranîna rêheval Zîlan Destan dest bi hemleyekê kir. Me destpêkê de hemleya xwe bi daxuyaniyekê da destpêkirin û di hundirê daxuyaniya xwe de me xwest ku em jiyana rêhevala Zîlan Destan bi kurtasî bînin ser ziman û bidin naskirin.

Di vir de yek ji armanca me ew bû ku me bangewazî li hemû jinên ciwan kir ku ew jî weke rêheval Şehîd Zîlan di jiyana xwe de gavên mezin Bavêjin. Ji ber ku em ji dizanin ku bi hezaran jin di bin feraseta zilamperestî de dijîn û ji ber tirs, zor û zehmetiyên civakî û malbatî bêdeng dimînin.

Dibe ku em ferq nekin an jî nekevin ev ferqa zanebûnê jî feraseta serdestiya mêr bi her awayî li ser me tê meşandin. Ji ber ku jin hîna di zaroktiya xwe de li ser kevneşopî, edet û teqelîdan û qebûlkirina feraseta serdestiyê tînen perwerdekirin. Di bin navê şeref û namûsê de jin hîna di zaroktî û ciwantiya xwe de tînen kolekîrin.

Weke jineke ciwan jiyana şehîd Zîlan jî sembola têkoşîna li dijî vê feraseta civakî ye. Ji ber



vê yekê me xwest ku ev hemle bibe amûrê rizgarbûna bi hezaran jinan ji serdestiya mêr û desthiladariya baviksalar.

Yek ji armanca me bi vê hemleyê ew bû ku em karibin xwe bigêhênin hemû jinên ciwan û jiyana rêheval Zîlan bi wan bidin naskirin ku jinên ciwan yê ku di bin feraseta baviksalar a civakî de hebûna xwe winda dikin jiyana rêheval Zîlan ji xwe re weke mînak bigirin, bi hêz, vîn û cesareta wê tevî nav refên têkoşîn û şoreşê bibin.

Me di berfirehiya hemleya xwe de xebatên wekî dayina

daxuyaniyan, belavkirina belavok, rojname, lidarxistina perwerde û HWD. dan meşandin. Di vê berfirehiyê de xebatên em hîna berdewam dikin. Em dizanin ku dijminê faşîst û mêtînger ku dixwaze bi hedefgirtina pêşeng û rêhevalên me vîn, hêz û manewiyeta şoreşê û gelê me bişkîne. Em jî bi têkoşîn û şerê xwe dibêjin ku em ê bi rihê rêhevalên xwe yê têkoşer ji bo parastina şoreşa xwe bikin bersivên giran bidin çeteyên faşîst. Me li ser vê esasê ji bo têkoşîna li dijî cureyên serdestiya mêr dest bi

hemleya "Dem Dema Zîlanan e" kir. Ev hemle ji bo me bû amûrê derbasbûna gelek malan û naskirina gelek jinan. Em di berfirehiya hemleya xwe de gîhaştin armanca xwe ku em jiyana û têkoşîna rêheval Zîlan Destan bidin naskirin û bîranîna wê bidin jiyandin. Em weke Jinên Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger careke din bi rêya vê xebata xwe bang li tevahî jinên ciwan dikin ku di nav refên azadî û şoreşê de cihê xwe bigirin. Werin em feraseta serdestiya mêr û baviksalar bi hev re ji kok de hilweşînin û azadiya xwe misoger bikin.

## Hemleya JKŞ a Destkeftinên Şoreşa Jin

Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) berî 11emîn salvegera şoreşê de hemleyekê di berfirehiya "Di şoreşê de destkeftinên jin, şoreşa me hêza me ye em xwedî lê derkevin" da meşandin.

### Kobanê

Jinên Komûnîst li Kobanê di berfirehiya hemleyê de xebatên weke civîn, serlêdana malan, belavkirina broşûr û rojnameya Raperîn meşandin. Weke dawiya hemleyê jî jinên komûnîst li kêleka Feratê şahiyek lidarxistin û seminer hat rêxistinîkirin.

Di beşa semînerê de axaftina vekirinê endama JKŞê Bihar Mistefa kir. Bihar Mistefa bal kişand ser zehmetiyên ku jinan berî şoreşê jiyana dikirin. Bihar Mistefa xuyakirin ku deva şoreşa jin destkeftinên girîng hatine bidestxistin û ev destkeftin îro di bin gefa paşverûtiya serdestiya mêr de ye.

Piştî li ser navê Meclîsa Kobanê ya JKŞ Xanim Kobanê

mafa axaftinê girt û xuyakirin ku di aliyekî de jin jî hîna di bin bandora serdestiya mêr de ne. Xanim Kobanê anî ser ziman ku pêwîst e ku tevahî jin li dijî zagona pirjinî derkevin.

Di axaftina li ser navê JKŞ bal hat kişandin ser girîngiya rêxistinbûn tevgerkirina bi hev re. Di axaftinê de wiha hat gotin: "Serdestiya mêr zû bi zû dest ji desthiladariya xwe bernade, li dijî vê divê em jin bi awayekî hîna xurtir têbikoşin, ji bo ku em karibin destkeftinên xwe biparêzin divê em bibin hêzeke rêxistinîkirî, ya em dibi yek, ya jî am yek bi yek tune dibin." Piştî semînerê şahiyê bi dîlanan hat dawîkirin.

### Dirbêsiyê

Li Dirbêsiyê di berfirehiya hemleyê de xebatên weke li saziya TKŞê civînek hat lidarxistin, bîranîna pêşenga komûnîst a ciwan Zîlan Destan rêxistinîkirin. Di beşa yekemîn de civînê di şexsê şehîd Zîlan Destan de diyarkirin ku şehîd Zîlan di destpêka avakirina

JKŞê de roleke girîng lîstiyê. Di axaftina de hat gotin ku "xwedî lê derketina bîranîna rêheval Elende El Mihemed tê wateya parastin û pêşxistina destkeftinên şoreşê."

Di beşa duyemîn de jî li ser destkeftinên jin û pirsgerêkên pêşketina şoreşê semînerê da. Fatma Hisên di axaftina xwe de li ser mijarên wek "zewacên di temenê biçûk de, zewacên zêde, kuştinên jin û tundiya li ser jinê sekinî" û pirsgerêkên ku di vî milî de tînen jiyîn anî ser ziman. Fatma Hisên di dawiya axaftina xwe de anî ser ziman ku "Divê em li dijî êrîşên serdestiya mêr bi awayekî hîna xurtir têbikoşin". Piştî axaftina Fatma Hisên semînerê bi nîqaşên serbest berdewam kir.

### Hesekê

Li Hesekê di berfirehiya xebata hemleyê de serlêdana saziyên jin hatinkirin û li ser hemleyê nîqaş hatin meşandin û broşûr û rojnameya Raperîn li kampên Koçberan, bajarên

Hesekê û Til Temirê hatin belavkirin. Bi awayekî berfireh serlêdana jinan hat kirin û li ser naveroka hemleyê nîqaş hatin meşandin. Li navenda bajêr û kampa Serê Kaniyê du perwerde hatin lidarxistin. Dîsa li saziya TKŞê filmê Qahîre hat temaşekirin û perwerdeyek hat dayin.

### Qamişlo

JKŞ di berfirehiya hemleyê de xebatên wekî "di şoreşa Rojava de destkeftinên jin û pirsgerêkên pêşketina şoreşa jin" da meşandin. Xebatên wekî di bazaran de belavkirina rojnameyên Serkeftin, Raperîn û broşûr hatin meşandin. Di nîqaşan de bal hat kişandin ser berdewamiya serdestiya mêr. Di nefsa berfirehiyê de semînerê hat lidarxistin. Semînerê bi rêzgirtin destpê kir. Di semînerê de li ser qanûna jin û pirsgerêkên sepandina wê hatin meşandin. Di semînerê de bangewaziya jinên ciwan hat kirin ku xwedî li pêşeroja xwe derkevin.



# Di Têkbirina Serdestiya Mêr De Rola Hezkirin û Zanebûna Jin

Jinên ku ji bo jinan têkoşîna azadiyê didin meşandin sedsala 21emîn weke sedsala azadî û şoreşên jin bi nav kirin. Ên ku vê pêk bînin jî dîsa em jin in. Kirde û pêşengên ji destpêka salên 1990an heta salên 2000an û salên piştî wê mohra xwe li têkoşîn, berxwedan, serhildan û bi taybetî jî mohra xwe li şoreşa Rojava xistin. Jinên sosyalîst vê têkoşînê bi rûmeteke mezin didin meşandin. Ji ber vê sedemê jinên komûnîst dema ku di aliyekî de têkoşîna çînî didin meşandin di heman demê de têkoşîna azadiya zayendî jî didin meşandin. Ji ber ku di tevahî tecrûbeyên şoreşan de hatiye dîtin ku şoreşeke ku tê de azadiya zayendî ya jin tune ye tu carî azad nabe.

Lê em jinên kirde yên ku têkoşîna azadiyê didin meşandin dema ku em ji bo cîhaneke bêyî mêtîngerîya zayendî û kedê tédikoşin em bi jinan re tékiliyên xwe di kîjan bingehê de datînin hêjayî nîqaşê ye. Em jin ji bo ku bi hezar salan e bikevin çavê mêr (bav, bira, ap, xal, hevjin û hwd) ji bo ku di jiyana wan de cihêkî cuda bigirin ketin tékiliyên reqabetê. Ji bo ku mêr pesna me bidin em ketin misabeqeya dayina "xizmetek hîna baş". Me her tim hewl da em ji bo hevjinên xwe bibin hevjinêke herî baş, ji bo zarokên xwe bibin dayikên herî baş. Me ev car caran bi reşkirina jinên kêleka xwe kir, car caran bi dayina pesna xwe kir. Em bi cih anîna rolên ku civakê daye me hem bûn sedema xurtbûna kapîtalîzmê û hem jî bûn sedema berdwamiya serdestiya mêr.

Bi pêşketina milkê xas, mirov ji bo parastina milkê xwe yê xas hest û taybetmendiyên xwe yên herî xweşik ên mirovî windakirin. Her ku kapîtalîzm û kûrewîbûna emperyalîst pêş ket em gîhaştin asta ji bîrkirina ev hest û taybetmendiyên mirovî. Weke ku rêbera komûnîst ya bîrdozî rêheval Kutsiye Bozoklar dibêje "Mirovên ku di civaka kapîtalîst û tevahî civakên spartî mêtîngeriyê de dijîn xwe bi çî rengî bi nav dikin bila bikin, li ser tékiliyên ku spartiyê mirov mirovan îstîsmar dike teşe girtine." Yanê mirov biyanî mirov bûye. Afirandina "mirovê nû" destpêkê de erka me ya

şoreşgeran e.  
Erka jinên komûnîst a



sereke jî li dijî f e r a s e t a serdestiya mêr, xurtkirina hezkirin, vîn û hişmendiya jinê ye. Dema ku em ji hestên "reqabeta bi jinan re" qut bibin û dev ji wê hestê berdin em dikarin têkoşîna jin xurt bikin û bi vê rêyê azadiya jin mayinde bikin. Ji ber ku em jin tena bi kirdebûn û avakirina tékiliyên hezkirin, piştgirî û yekîtiyê dikarin bi hêz bibin.

Lê gelo di carekê de avêtin û guhertina ewqasî taybetmendî û hînbûyînen civakî gengaz e? Bêguman na. Elbet hîna jinên komûnîst ên ku ji bo vê tédikoşin jî ji tevahî hînbûn û rolên kevneşopî qut nebûne? Nêzikatiya hemûyan jî ne weke hev e. Di carekê de nikare weke hev jî bibe. Hîna gelek taybetmendiyên me yên ku em li dijî wan têbikoşin hene. Yek ji noxteyên herî girîng jî hezkirina zayendî yanî jin e.

Jin dema ku ji bo azadiya jinan tédikoşin jî ger bingeha serdestiya mêr baş nas neke dikare ji hezkirina zayendî dûr bikeve. Gelo hezkirina zayendî çî ye? di jiyane de beramberiya vê çî ye? Di têkoşîna çînî de tifaqa jinên komûnîst ê herî bingehîn mîrên proleter in. Di têkoşîna çînî de jin û mîrên proleter bi hev re ji bo ku cîhaneke bê mêtîngerî, azadîxwez ava bikin têkoşîn dikin. Tam jî ji bo vê têkoşînê li vir tékiliyên ku jin bi jinan re ava dikin an jî jin û mêr bi hev re ava dikin di milê

hezkirina zayendî de di cihêkî girîng de

bikevin em çiqasî karê wan siviktir dikin? em çiqasî erkên ku rêhevalên jin didin me bi cidîyet bi cih tînin? gerek di nav kar de, gerek di jiyane de em çiqasî rûyê xwe dizivîrin jinan? ji bo xurtkirina rêhevalên xwe em wese û asta xwe çiqasî xurt dikin? Di qadên kar de dema ku rêhevalên jin û mêr hebin em çiqasî pêwîstî bi bihîstina dengê hevala hin dibînin? Êşa ku jin di nav civakê de dijîn em çiqasî di hundirê xwe de hîs dikin û dikevin tevgerê?

Rêhevaltiya jin an jî hezkirina zayendî tenê ne qebûlkirina her tiştî hevalên jin e. Rêhevaltiya jin di heman demê de bi hezkirineke xurt û rihê rêhevaltiyê rexnekirin û dayina rexnedayinê ye. Dema ku bingeha rexne û rexnedayinê li ser pêşxistin û xurtkirinê ava kirî be wate bi dest dixê. Di têkoşîna şoreşger de rêxistinkirina jinan û xurtkirina rêhevalên xwe yên jin li dijî têkbirina feraseta serdestiya mêr dibe têkoşîna herî xurt. Di heman demê de xurtkirina vê yekê dibe nîşanameya qutbûna ji hînbûyîna û rolên civakî.

Em di tevahiya nivîsê de dikevin ferqê ku li vir peyva bingehîn a kilîd dîsa ked e. Keda ku tê dayin dereng an jî nêzik her tim beramberiyeke wê heye. Weke jinên sosyalîst û komûnîst noxteya ku em herî zêde li ser kûr bibin ked e. Em hemû zehmetiya derxistina jinan ji pêkûtiya zarok – hevjin – mal dizanin. Lê em kêfxweşiya xwe ya ku dema ku em jinên ku dikarin ji vê pêkûtiyê derdikevin dibînin bifikirin. Lewma divê em jinên komûnîst karibin jinan ji vê pêkûtiyê derxin, di nav têkoşîneke berdwam de bin. Di ev cîhana ku spartiyê feraseta serdestiya mêr de weke jin tenê em ji hev fêm dikin û em tenê bi têkoşîna xwe ya hevgirtî dikarin xurt bibin. Di civakê de gotinek heye ku dibêje "Jin kurmê jinê ye" lê ev gotin girêdayî feraseta serdestiya mêr a kapîtalîst e. Em aksê vê dibêjin "Jin welatê jin e" Tirs a pergala kapîtalîst a serdestiya mêr jî ev e. Ji ber ku cîhanê tenê jinên karker, kedkar, sosyalîst û komûnîst dikarin rizgar bikin. Ketina vê ferqê di xurtkirina hezkirin û zanebûna hişmendî re derbas dibe.

disekine. Di nav têkoşînê de em berpirsiyartiyên cuda digirin ser milên xwe û ji bo bi cih anîna van berpirsiyartiyên em dixebitin.

Yanê dema ku karek bê kirin destpêkê de fikrandina li ser rêhevalên jin, hakîmiyeta mêr her çiqasî ku li ser kar zêde bibe jî derxistina pêş ya jinan mînakên vî mijarê ne. Dixebata rêxistinkirina girseyên polîtîk de destpêkê de fikrandina li ser girseyên jin û berê xwe dayina vî karî, bê westan çûyîna jinan û rêxistinkirina wan, bê westan berdwamkirina perwerdeyên jinan û xurtkirina hêza rêvebirina jin, di her astê de pêşxistina jinan, hêzgirtina ji jinan û hêz dayina wan ji bo me mijarên nîqaşê ne. Lê tenê cihê ku hezkirina jin û rêhevaltiya jin tê de bilind dibe ne ev e jî. Ya herî girîng dema ku em jinan rêxistin dikin û berpirsiyartiya kar didin wan di heman demê de rêxistinkirina serkeftina wê ye. Dema em jinan rêxistin dikin û dibin rêhevalên hev pêwîst e ku di destpêkê de em ked bidin û berî xwe ji bo serkeftina rêhevala xwe bixebitin. Li vir mifteya serkeftina hezkirina jin ked e.

Em rêhevalên xwe yên jin ku berpirsiyartiya kar digirin ser milên xwe bifikirin. Em di qadan de rêhevalên xwe çiqasî di pirsgêrêkan de difetîsin, ji bo ku ew di karê xwe de pêş

## Kuştina Jinê Feraseta Serdestiya Mêr e

### Bihar Mistefa

Di destpêka dîroka jinê de, jin rastî her cûreyên tundiyê yên wekî nefîsî, aborî, cinsî, fizîkî " HWD tên. Mînakên vê yekê pir in. Wek adet û teqelîdên eşîrtî, sîstema ku tenê şertê wê ji bo jin hatiye diyarkirin û jinê di nava xwe de diperçiqîne, jin wekî namûs û şeref tê dîtin. Li gorî sîstema eşîrtî jin li ser sedemên pir biçûk tên kuştin, tên berdêlkin. Ji bo du eşîr li hev werin jin tên firotin, dema ku temenê jinê digêhêje 14 salî pêwîst e bê zewicandin. Di milê zewacê de biryarên jinê nayên esasgirtin. Malbat çawa biryar bigire ew e. Jin di nava malbatê de jî rastî tundiyê mezin tên. Du nava malbatê de jin bi axaftinên weke "Tu jinî gotin ne a te ye, biryar ne a te ye, tu jinî eyb e, şerm bike" tên mezinkirin. Dema ku jin ev zîhnîyeta baviksalarî qebûl neke jî encama wê tundî ye.

Jin di nav malbatê de, di nav civakê de rastî tacîz û destdirêjiyê tê. Li gorî sîstema eşîrtî ji kurê ap re maf e ku biryara zewaca jin di destê wî de be, an jî carna jin ji milê kurê ap de rastî destdirêjiyê tê. Piştî ruxmî ku zilam sucdar e jin li ser vê yekê bi haceta namûsê li dewsa mîrê sîncdar jin tê ceza kirin û tî kuştin. Di kuştina jin jî hemû zilamên eşîrê top dibin û moral didin hev, wek şahî çêdikin û jinê bi tililiyan dikujin. Jin ji milî civakê de pir caran rastî tundiyê tê. Di civakê de mirina jinê evqasî erzan e ku kes bi dû rastiye nakevin.

Heya zarokên 5 an 6 salî jî li rastî destdirêjiyê tî û piştî

hovane tî kuştin û tî avêtin, Yasmîna 5 salî ya ku li Minbicê rastî destdirêjiyê hatibû û ji alî malbatê ve hatibû kuştin mînaka ve ya herî şênber e. Yanî heya goran destek ax ji bo jin pir dibînin ku piştî kuştina jin wê davêjin û dibe ku" ev eyp kirêya ax ji bo wê pir e bila ax jî heram nebe. Jin ji dextê civak aded û teqelîdan û ji zîhnîyeta baviksalarî tê asta xwe kuştinê. Tadeya malbatî, civakî û eşîrtî digêhêje wê astê ku ev dihêle ku jin xwe intihar bikin, pir carî jî jin ji aliyê endamên malbatê ve tî kuştin û ji bo ku kesê ku kuştîye ceza negire ew kuştin weke intihar tê nişandan.

mafê jin di her milî de jê hatiye standin, heya dema jin zarok tîne zarok ne zarokê jinê ye, ew weke zarokê zilam e. Her tişt ji bo wê qedexe ye. Wek " derketina ji mal, axaftin, xwestina mafên xwe, xebitîna derveyî malê, heya li xwe kirina cilan pêwîst e li gorî edet û teqelîdên eşîrê bê. Civak her tim vîna jinê lawaz dibîne. Ruxmî ku em li ser axên şoreşa jinê dijîn, lê jin hîna di hundirê malan de ne, keda wan a hundirê malê nayê dîtin. Hîna jin ji dûrxistina xwe, bi rêxistinkirinê çaretî jiyana dike û digêhêje asta intiharkirinê, ji pêşxistina xwe dûr dimîne. Hîn jin rastî lêdan, zewaca bi temenê biçûk tê. Em wek Jinên Komûnîst berpirsiyartiya vê yekê rakin û di şexsê xwe de bidin avakirin. Em bi vê baweriyê dikarin ji hêza xwe encam derxin. Lê ji xwe û ji vîna xwe, ji şoreşa xwe bawer ev rê me digîne jiyana azad.

## Li Dijî Qetlîamên Jin; Jin Jiyan Berxwedan



JKŞê û TKŞê li Heskê bi boneya êrîşên dewleta dagirker a Tirk ên li ser Rojava û pêşengên wê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de êrîşên dewleta Tirk hat şermezar kirin hat xuyakirin ku wê li dijî van êrîşan berxwedan hîna zêdetir bê mezinkirin.

Endama JKŞê Wîdad Mihemed ya ku daxuyanî xwend di axaftina xwe de êrîşên dewleta Tirk ên herî dawî yê 27 û 28ê Tîrmehê yê li gundê Xezna ya Qamişlo û Amûdê bi bîr xist da xuyakirin ku di van êrîşan de 7 şoreşger şehîd ketine û du kes jî birîndar bûne.

Wîdad Mihemed axaftina xwe wiha berdewam kir "Bajarên me yê ku li ser xeta sînor her roj tîne bombebaran kirin. SÎHA'yên wan sînor derbas dikin û ji bo êrîşên sîwîqestê li derfetan digerin. Li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî yê ku di bin dagirkeriyê de ne ger roj sîwîqest mirovahiye berdewam dikin û gelê me bêav tê hiştin, daristanên me tîne şewitandin."

Wîdad Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Dewleta mêtînger

